



Araştırma Makalesi • Research Article

Ji Perspektîfa Teoriya Polîsîstemê Rol û Karîgeriya Wergêranê di Geşedana Edebiyata Kurdî da

Çoğuldizge Kuramî Perspektîfînden Çevirinin Kürt Edebiyatının Gelişimindeki Rolü ve Etkisi

The Role and Effect of Translation on the Development of Kurdish Literature from the Perspective of Polysystem Theory

Güneş Kan*

Kurte: Teoriya polîsîstemê teoriyek e ku wergêranê di peywenda çandê da vedikole. Li gor teoriya polîsîstemê çand ji gelek sîsteman pêk hatiye. Edebiyat jî di nav wan sîsteman da sîstemeke pir-tebeqeyî (multi-layered), yanî polîsîstemek e ku ji gelek sîstemên edebî pêk hatiye. Wergêrana edebî yek ji wan sîsteman e ku polîsîstema edebiyatê ava dike. Wergêrana edebî di inşâ, şewegirtin û geşedana polîsîstema edebiyatê da xwedî roleke diyarker e. Di vê gotarê da, li dor van agahiyan me bala xwe da wergêrana kurdî ya edebî û rol û giringiya wergêranê di derçûn, şewegirtin û geşedana edebiyata kurdî da. Vekolîn, bi wergêran û edebiyata kurdiya Bakur (kurmançî) hate bisinorkirin ku qonaxên edebiyata kurdî ya Sovyet, Hawar, Swêd û Bakur vedigire. Di encamê da hate dîtin ji destpêka edebiyata kurdî ya modern heta niha di şexsiyeta nivîskarên kurd ên sereke û pêşeng da wergêran bûye qadeke ceribîner bo wergirtina zimanê edebî, berfirehkirina sînor û derfetên kurdî, keşîfkirina dewlemendî û potansiyela kurdî. Herweha wergêran bo wergêran kurd bûye zemîneke tecrubekirin û pratîzekirina nivîsandinê, dergeheke derbasbûyîne ji wergêriyê ber bi berhemdayîne yan jî qadeke xurtkirina nivîskariyê. Ev jî destnîşan dike ku bi taybetî di peywenda zimanî û tecrubeya nivîskariyê da rol û karîgeriyeke erênî ya wergêranê çêbûye di geşedana edebiyata kurdî ya modern da.

Bêjeyên Sereke: Teoriya Polîsîstemê, Edebiyata Kurdî ya Modern, Wergêran, İnşâ û Geşedana Edebiyatê, Kurdiya Bakur (kurmançî)

Öz: Çoğuldizge kuramî çeviriyi kûltür bağlamında ele alan bir kuramdır. Çoğuldizge kuramına göre kûltür birçok sistemden oluşmuştur. Edebiyat da o sistemler içinde çok-katmanlı bir sistem, yani birçok yazınsal sistemden oluşan bir çoğuldizgedir. Edebi çeviri ise edebiyat çoğuldizgesini oluşturan sistemlerden biridir. Edebi çeviri edebiyat çoğuldizgesinin inşası, şekillenmesi ve gelişmesinde belirleyici bir role haizdir. Bu makalede, bu bilgiler bağlamında Kürtçe edebi çeviri ile modern Kürtçe edebiyatın şekillenmesi ve gelişmesinde çevirinin rol ve önemine dikkat çektik. İnceleme, Kürtçe edebiyatın Sovyet, Hawar, İsveç ve Kuzey evrelerini kapsayan Kuzey Kürtçe (Kurmançî) ile üretilen çeviri ve edebiyat ile sınırlandırılmıştır. Sonuç olarak görülmüştür ki modern Kürtçe edebiyatın başlangıcından bugüne başat ve öncü Kürt yazarların özelinde çeviri, edebi dil edinimi, Kürtçe'nin sınır ve imkanlarının genişletilmesi, Kürtçe'nin anlatım zenginliği ve potansiyelinin keşfedilmesi için

* Dr. Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî
ORCID: 0000-0002-7097-6047, rojxun@hotmail.com

Cite as/ Atîf: Kan, G. (2024). Ji perspektîfa teoriya polîsîstemê rol û karîgeriya wergêranê di geşedana edebiyata Kurdî da. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(1), 33-49 <http://dx.doi.org/10.18506/anemon.1309174>

Received/Geliş: 02 Jun/Haziran 2023

Accepted/Kabul: 05 April/Nisan 2024

Published/Yayın: 30 April/Nisan 2024

deneysel bir alan olagelmıştır. Ayrıca çeviri Kürt çevirmenler için yazma deneyimi ve uygulama zemini, çevirmenlikten eser vermeye geçiş eşiği ya da yazarlığını güçlendirme sahası olmuştur. Bu da özellikle yazarlık deneyimi ve dilsel bağlamda modern Kürtçe edebiyatın gelişmesinde çevirinin olumlu bir rol ve etkisinin olduğunu göstermektedir.

Anahtar Kelimeler: Çoğuldizge Kuramı, Modern Kürtçe Edebiyat, Çeviri, Edebiyatın İnşası ve Gelişimi, Kuzey Kürtçe (Kurmanci)

Abstract: Polysystem theory is a theory that deals with translation in the context of culture. According to the polysystem theory, culture consists of many systems. Literature is also a multi-layered system within these systems, i.e, a polysystem consisting of many literary systems. Literary translation is one of the systems that make up the literary polysystem. Literary translation plays a crucial role in the construction, formation and development of the literary polysystem. In this article, we have drawn attention to the Kurdish literary translation and the role and importance of translation in the formation and development of modern Kurdish literature within the framework of this information. The analysis is limited to the translation and literature in Northern Kurdish (Kurmanji), which includes the Soviet, Hawar, Sweden and Northern phases of Kurdish literature. As a result, it is seen that, from the beginnings of modern Kurdish literature to the present day, in the context of prominent and pioneering Kurdish writers, translation has been a field of experimentation the acquisition of a literary language, the expansion of the boundaries and possibilities of Kurdish, and the exploration of the richness and potential of expression in Kurdish. Moreover, for Kurdish translators, translation was an experience and a field of practice for writing, a threshold of transition from translator to author, or a field for strengthening their authorship. This shows the positive role and influence of translation in the development of modern Kurdish literature, especially with regard to the authors' experience and the linguistic context.

Keywords: Polysystem Theory, Modern Kurdish Literature, Translation, the Formation and Development of Literature, the Northern Kurdish (Kurmanji)

Destpêk

Girêdayî rewşa polîtîk, civakî, hêz, cografya, ekonomî û hin faktorên din wergêran li her derê armanc, erk û giringiyeke xwe ya ciyawaz heye. Heta dikare bê gotin armanc, erk, pîvan û stratejiyên wergêranê li gor guhêrbariya faktorên behskirî rû didin. Bo nimûne îngilîzî ji gelek aliyan ve zimanekî gerdûnî û serdest e, loma jî wergêran di îngilîzî da bi piranî ber bi zimanên din ên cîhanê tên kirin. Di roja îroyîn da îngilîzî zimanekî jêder e û têgihên gelek qadan bi îngilîzî ne. Zimanên ji îngilîzî werdigerînin, pîrî caran di şûna wan têgihan da yên guncan di zimanê xwe da bi cih nekirine, têgihên îngilîzî deyn kirine. Ji ber vê gelek zimanên cîhanê bi têgihên îngilîzî tije ne. Berevajî wê wergêrana ji zimanên din ber bi îngilîzî bi qasî wergêranên ji îngilîzî ber bi wan ewçend ne berbelav e. Herweha di wergêranên ji zimanên din ber bi îngilîzî da, bi giştî têgih an bêje nayên deynkirin, di şûna wan da berginda bi îngilîzî tê danîn. Wergêran di îngilîzî da zêde nirxeke xwe ya nûjen tuneye û di asta duyem da giringiya xwe heye. Ev mînak destnîşan dike ku wergêran ne bi tenê diyardeyêke zimanî yan jî veguhastina keresteyên zimanî ye, ew di heman demê da diyardeyêke pîralî ye.

Wergêran ji bo her welat û neteweyê giring e, lê ji bo yên pêşneketî û li dû hin geşedanên cîhanê mayî bêtir giring û pêwîst e. Li gor avakarê teoriya polîsîstemê Itamar Even-Zohar çand sîstemeke mezin, yanî polîsîstemek e ku ji gelek sîstemên dîtir ên wek edebiyat, perwerde, siyaset, medya û hwd. pêk hatiye. Hemû sîstemên di nava polîsîstemê da di nava danûstandin û hevkarîkeriyê da ne, têkildar û pevgerêdayî hev in. Li gor Even-Zohar wergêran bi tena serê xwe sîstemek e di nava polîsîstemê da. Li aliyê din wergêrana edebî bi sîstema edebiyatê ra dixebite, beşdariyê di çêbûna polîsîstema edebiyatê da dike. Bi nêrîna Even-Zohar li gor serdem, rewş, şert û mercan di polîsîstema edebiyatê da rewşa wergêranê diguhere. Li gor rewş û giringiya wergêranê di polîsîstema edebiyatê da, wergêran yan di asteke duyem da ye û nirxeke wê ya nûjen tuneye wek mînaka wergêrana îngilîzî yan jî ew di asta yekem da pir giring û pêwîst e û deriyê nûjeniyên e. Bi gotineke din wergêran li gor girêdana xwe û edebiyatê yan di navenda polîsîstema edebiyatê da bi cih dibe yan li çeperê dimîne. Dema wergêran di navenda edebiyatê da be di şewegirtina polîsîstema edebiyatê da roleke çalak dibîne. Di rewş û demên wiha da wergêran di navendê da bi cih dibe: 1) Polîsîstem hîn ava nebûye yan jî edebiyat hîn “ciwan” e û bi cih nebûye; 2) edebiyat yan “çeperî (ne-navendî)” yan “bêhêz” e yan jî hem bêhêz hem jî çeperî ye; 3) xalên hevçerxê, qeyran û valahiyên edebî yên di edebiyatê da. Di rewş û demên wiha da wergêran rol û

giringiyeke xwe ya navend heye û elzem e (Gürçağlar, 2021: 129-132; Even-Zohar, 1990: 45-51; Even-Zohar, 2004: 191-200). Eger em li dor van her sê xalên ku wergêranê pêwîst dibîne û wê tîne navendê, li edebiyata kurdî binêrin em ê bibînin ku di kurdî da pêwîstî bi bizaveke çalak a wergêranê heye. Edebiyata kurdî bi giştî ne bêhêz e û ne ewçend ciwan e. Lê eger em edebiyata kurdî ya klasîk bidin aliyekî û li edebiyata kurdî ya niha, ya modern binêrin, rastî em dikarin bibêjin edebiyata kurdî qismen hem ciwan e û hem jî ji bilî hin nimûneyên serketî ne pir bihêz e. Herweha em nikarin bibêjin edebiyata kurdî edebiyateke navendî ye û li ser edebiyatên din karîger e, jê wêdetir ew edebiyateke navxweyî ye. Xala sêyem jî –ya ku wergêranê pêwîst dike- ji bo edebiyata kurdî ya niha guncan e (bnr. Töre, 2015: 52). Lewre ji destpêkê heta niha edebiyata kurdî ya modern di nav qeyranê da ye û bi giştî ji normên “çawanî”yê bêtir bi normên “çî”yê hatiye berhemandin. Bi gotineke din wêfên edebî gawekê li paş mane, bi giştî ji endîşeyên edebî bêtir hin endîşeyên din ên wek zimanî, bîrdozî li pêş bûne. Li aliyê din dikare bê gotin ku her qonaxêke edebiyata kurdî ya modern di heman demê da xaleke hevçerxê ye. Di edebiyata kurdî ya modern da yeksaniyek, yekparetiyek, berdewamiyek pêk nehatiye, ew bi hemû qonaxên xwe bi awayekî perçeyî, domnekirî heta roja îro hatiye. Bi giştî qonaxêke edebiyata kurdî, ji ber sedemên ne-edebî, bi dawî bûye û yeke din careke din ji serî û jinûve dest pê kiriye. Loma dijwar e ku em bibêjin di edebiyata kurdî da ji duh ber bi niha zîncireyêke tam û domdar pêk hatiye, beravajî ew zîncîre hertim bi hincetekê qut bûye. Lewma her qonaxêke edebiyata kurdî[ya Bakur] ya modern –Stenbol,¹ Sovyet, Hawar, Swêd, Bakur- di heman demê da xalên hevçerxê ne. Qonaxa niha ya edebiyata kurdî jî xaleke hevçerxê ye bi destpêkirin û geşedana xwe û ev taybetmendiya wê hîn berdewam e.

Hebûna her sê xalên behskirî di edebiyata kurdî da ku wergêranê bo edebiyat û çandekê pêwîst dikin û wê dikin navendê, bala me kişand û kir ku em vekolin ka çî giringî, karîgerî û rola wergêranê hebûye li ser derçûn, şewegirtin û geşedana wê. Di vê çarçoveyê da em ê şîrove bikin ka çî karîgeriya wergêranê di çêbûn, şewegirtin û geşedana sistema edebiyatê da heye; nêrînekê bidin hin bizavên wergêranê yê li cîhanê û pêwendîya wan a bi edebiyatê ra; armanc û pîvanên wergêrana kurdî vekolin û herweha hin bizavên -yan bizavnebûnên- wergêrana kurdî û karîgerî, rol û giringiya wan bo geşedana edebiyata kurdî binirxînin.

1. Karîgeriya Wergêranê li ser Çêbûn û Geşedana Polîsistema Edebiyatê

Edebiyatek heta çî radeyê neteweyî ye? Di serî da zimanê berhemê û paşê karakterên neteweyî, mijarkirina çand, dîrok, cîhanbînî, awayê jiyîna xweserî ya neteweyekê, edebiyata neteweyî pêk tînin. Ji aliyê din ve edebiyata neteweyî, yanî berhemên bi karakter û motîfên neteweyî dagirtî fikra netewetiyê, neteweparêziyê xurt dike. Ligel hevkarîgeriya netewetî û edebiyatê, edebiyateke xwerû neteweyî ne pêkan e. Lewra hertim danûstandin û pêwendiyên pîralî çê dibe di navbera edebiyata neteweyî û edebiyatên biyanî da. Ev yeka jî bi saya wergêranê çê dibe ku di heman demê da edebiyatên neteweyî ber bi edebiyata gerdûnî ve dibe. Bi girêdan û têkiliyên edebiyata cîhanê edebiyata neteweyî ji nûjeniyên fikrî û edebî, îmkanên nû yê edebî û zimanî hayedar dibe û bi pêş ve diçe.

Ji bo nivîskar/helbestvanan -ku bi berhemên xwe beşdariyê li edebiyata cîhanê dikin û berhemên wan ji bo xebatên edebiyata berawirdî û edebiyata cîhanê dibin malzemeyên sereke- wergêran giringî û pêwîstiya xwe heye. Nivîskar yan helbestvan ji bo ku karê xwe baş û bi serketî bike divê hay ji edebiyata cîhanê hebe, berhemên sereke, serketî û nirxdar ên edebiyatên din bixwîne û jê sûdewar bibe. Ne mimkin e nivîskar yan helbestvanek hemû zimanên edebiyatên giring ên cîhanê bizanibe. Bêwate ye bikeve pey armanceke wiha jî ku wê çaxê dê nikaribe karê xwe yê esasî bike, yanî dê nikaribe biafirîne. Li vir wergêran tê hawarê, bi rêya wergêranê berhemên edebiyatên cihêreng tînin ber destê xwîner, nivîskar û helbestvanan. Bi saya wergêranê nivîskar dikare xwe bigihîne nivîskar û berhemên giring, nirxdar û balkêş ên edebiyatên wek îspanyolî, hîndî, afrîkayî, çînî, swêdî, yewnanî, elmanî, farisî, erebî û edebiyatên din ên cîhanê; dikare ji edebiyat û nivîskarên dîtir agahdar bibe. Bi xwendina berhemên edebiyatên din bivênevê karîgeriya wan jî pêk tê. Berhemên wergêrayî, deriyê cîhanên nû û cihêreng bo

¹ Ji ber ku nivîskarên wê bi piranî bi kurdiya Bakur (kurmancî) nivîsandine Qonaxa Stenbolê jî jixweber di sinorên xebatê da bi cih dibe. Lê ji ber ku tê da doneyên pêwîst nînin ji bo destnîşankirina girêdana wergêran û geşedana edebiyatê ev qonax li derveyî nirxandinê dimîne.

xwîner û nivîskaran vedike. Xwîner û nivîskar edebiyat û çandên din nas dike, sînoren cihanbîniya wan fireh dibe. Bi nasîn û hevkarîgeriya edebiyat û çandên cihêreng û nû di ziman, çand û edebiyata neteweyî da geşedan, dewlemendî, guherîn û veguherîn pêk tê. Di vê peywendê da wergêran di însa û şewegirtina ziman, çand û edebiyatê da roleke sereke û zêde giring dibîne. Bi rêya wergêranê ji edebiyatên din şewe, tema, estetîk û awayên îfadekirina edebî, motif, terz û cureyên nû û hwd. vediguhezîna edebiyata neteweyî. Di encamê da sentezek pêk tê di navbera edebiyata neteweyî û ya cihanê da, edebiyata neteweyî ligel sûdwegirtin û sentezên ji edebiyata cihanê bi xwe jî beşdarî edebiyata cihanê dibe. Bi vî rengî wergêran pevgerîdanê di navbera edebiyat, çand û neteweyên cihê da dike û wek “pir”ekê wan nêzikî hev dike (Özyön, 2019: 39.)

Nivîskar û xwînerên zimanekî dikarin bi saya wergêranê edebiyatên din û nivîskarên wan nas bikin. Nivîskar bi nasîna wan dikarin hay ji nixê nivîskariya xwe û ji edebiyata xwe bibin, kêmasî û zêdeyiyên xwe bibinin. Herweha nivîskar-wergêr, dikarin bi saya wergêranê li sînoren zimanê xwe – hem zimanê şexsî û hem yê neteweyî- varqilin. Wergêran di heman demê da berawirdkirina du zimanan e ku bergînda vegotina zimanê jêder di zimanê armanc da tê bicihkirin. Di vê pêvajoyê da qelsî, kêmasî yan dewlemendî û hêza zimanekî derdikeve holê. Ji ber hin sedeman rêyên geşbûnê li ber hin zimanan girtî ne. Loma di pêvajoya wergêranê da aliyên wan ên neyînî bêtir xwe didin der. Di serî da li gor nivîsandina berhemên telîf wergêrana berhemên bingehîn bêtir di zindîbûn û geşbûna zimanên wiha da kartêker e. Lewra Aydoğan jî dibêje wergêran ji bo zimanên wiha nisbet nivîsandina berhemeke telîf geşbûneke leztir dabîn dike (2001: 205). Lewre di wergêrana berhemekê da wergêr li bergînda bêje, îfade û awayê vegotina berdest digere û bi cih dike; lê di nivîsandina berhema resen da jinûvesazkirin mewzûbehs e ku di hin zimanan da ev yeka demeke dirêj digire ji ber ku ew ziman demeke dirêj ji derfetên vegotin û nivîsandinê bêpar mane.

Wergêrannasî girêdaneke xwe ya xurt heye bi disiplinên edebiyat û zimanî ra ji ber nêz-hevkarîgeriya xebatên wan. Ev nêz-temas û girêdana wergêrannasiyê bi ziman û edebiyatê ra, pir caran bûye sedema nediyarî û îxlalkirina sînoren wê. Jixwe demeke dirêj zanista wergêranê -wergêrannasî-beşeke ji van qadan dihate hesibandin û di peywenda xebatên van qadan da dihate vekolîn. Piştî sedsala 20an jî ber geşedan û guherîn-veguherînan, derçûna teorî û nêzîktêdayînen ciyawaz ên qadê, wergêrannasî bûye disiplineke serbixwe û xebatên têkildarî wergêranê di bin vê disiplinê hatine kirin (Yıldırımçakar, 2021: 25-29). Piştî bûna wergêrannasiyê wek disiplineke serbixwe jî xebatên li ser têkiliya wergêranê bi edebiyat û zimên ra dîsa hatine kirin, lê îcar di çarçoveya navdisiplînî û peywendên çandî da. Teoriya polisîstemê jî yek ji wan xebatan e ku wergêranê di peywenda çandî û çarçoveya navdisiplînî da dinirxîne. Teoriya polisîstemê esasen dinirxîne ka çi karîgerî, giringî û rola wergêranê heye di avabûn û pêşveçûna edebiyat û çandan da. Di çarçoveya teoriya polisîstemê da rexne û gengeşiyên li dor têgihên *edebiyata bilind û edebiyata nizm, çanda bilind û çanda nizm* jî hatine rojevê (bnr. Hezil, 2021: 161). Lê ev rexne ne di sînoren vê xebatê da ne û nirxdariya edebiyatan ne armanca wê ye. Dîsa jî em dikarin bibêjin tê famkirin ku teoriya polisîstemê di bingehê da rewşeke dijraber û hiyerarşik ferz kiriye di navbera çand, edebiyat û zimanê jêder û yê armanc da. Di xwemaliya edebiyatê da li gor teoriya polisîstemê, wergêran ji edebiyatên bingehîn, xurt, pêşketî ber bi edebiyatên hîn (a) neavabûyî, ciwan; (b) qels, dorhêlî; (c) di nava qeyran û valahiyên edebî da (Even-Zohar, 1990: 47) tê kirin û dibe hinceta derçûn, şewegirtin û pêşketina sîstema edebiyata wergir. Di hebûna her sê rewşên Even-Zohar destnîşankirî da wergêran di însakirin û şewegirtin/teşegirtina sîstema edebiyat û çandê da roleke navendî digire ser xwe.

Serboriya derçûn û pêşketinên edebiyatên modern ên Rojhilata Navîn mînakên guncan in ji bo rastdêrana teoriya polisîstemê. Bingehên edebiyata modern li Ewrûpayê hatine avêtin û teoriyên edebiyata modern bi giştî navend-Ewrûpî ne. Edebiyatên modern ên Rojhilata Navîn, li ser wergêranên berhemên Rojavayî ava bûne. Bi wergêrana berhemên nivîskar û xwînerên Rojhilatî cureyên edebiyata modern ên wek roman, şano, çîroka hevdem, helbesta modern, gotar, rexne û hwd. nas kirine. Mînakên edebiyata Rojava, tesîr li nivîskar û xwînerên edebiyata wergir kirine. Wergêrên ku ew berhem wergêrabûn, îcar bi teqlîd û adaptasyonan berhemên ewil ên telîf nivîsandine û bi giştî edebiyatên modern ên Rojhilatî bi vî rengî dest pê kirine. Wekî vekoleran jî diyar kiriye tecrubeya derçûna edebiyata tirkî ya modern –ku di dema Tanzîmatê da dest pê kiriye- mînakeke di cih da ye bo vê rewşê. Ji aliyê

din ve di tecrubeya tirkan da wergêrana edebî, perçeyekî politikaya çandî ya neteweyî bû. Têkiliyê hevterîb û hevşîb heye di navbera wergêrana romanên, paşê derçûna cureya romanê di wêjeya tirkan da û rojavayîbûna civaka tirkan da. Xasma piştî îlana Tanzîmatê dewleta Osmanî berê xwe daye Rojavayê, li ser zemînên siyasî û civakî bizaveke “nûjenî”yê daye destpêkirin. Ji ber vê di warên wekî jiyana civakî, perwerde, wergêran û cureyên edebî da civaka tirkan di bin tesîra Rojavayê da maye. Xasma bi rêya edebiyatê –çî wergêran çî telîfên bi teqlîdkirinê nivîsandî- hêmanên çandî zûtir belav bûne di nava civakê da, herweha edebiyata tirkî guheriye û cureyên ciyawaz ên edebî hatine wergirtin (Özyön, 2019: 32; Bay Gülveren, 2019: 43).

2. Ji Cîhanê Hin Mînak bo Karîgeriya Bizavên Wergêranê di Înşa, Şewegirtin û Geşedana Edebiyat û Çandê da

Di edebiyata cîhanê da gelek mînak hene bo wergirtin/sentezên edebî yên bi rêya wergêranê ava bûne. Mesela cureya xezelê ku di edebiyata erebî da şeweyeke nezmê ya serbixwe tunebû û di edebiyata farisî da teşe girtiye (bnr. Saraç, 2022), dikeve nava sîstema edebiyatên Rojhilata Navîn ên wek ereb, kurd û tirkan. Em nikarin bibêjin belavbûna cureya xezelê li dewletên cîran yekser bi wergêranê bûye. Jê wêdetir ji ber têkilî û girêdanên çandî, dîrokî û dînî, herweha zanîna zumreya bilind bi zimanên farisî û erebî cureya xezelê rasterast bi rêya teqlîdê ketiye nava van edebiyatan. Herçiqas bi wergêrana metnên nivîskî nebe jî ev yeka bi zanîna zimên bûye ku em dikarin wek wergêraneke zimnî bihesibînin. Lêbelê edebiyatên Rojavayî encax bi rêya wergêranê xezelê nas dikin. Dûre piştî wergêranê bi nivîsandina helbestên hevşîb xezel di helbesta neteweyên Rojavayî yên wek îtalyan, alman û fransîzan da dibe hinceta avabûna tradîsyona cureyê helbestê. Herwekî din wergêranên oryantalîstên wek Hamer Von Purgstall, F. v. Diez û Oehlschlaeger ji edebiyatên farisî, erebî û osmanî, li ser berhema Goethe, *Dîwana Rojava-Rojhilat* karîger bûne. Bi taybetî wergêrana helbestên Hafîz ên ku Pursgstall wergêraye, ji bo nivîsîna vê berhemê îlham daye Goethe (Aytaç, 2009:43; Sakallı, 2014: 199). Li aliyê din wergêrana ji farisî bo almanî ya *Lambeya Bisêhr a Alaaddîn* ne bi tenê Goethe, herweha îlham daye wêjekarên din ên alman. Wekî din piştî wergêrana *Çîrokên Hezar û Yek Şevê* li fransî, li Rojava –xasma li Almanyayê- eleqeyê zêde li ser çîrokan çêbûye û çîrokên nû hatine nivîsîn. Di dawiyê da çîrokan, bi taybetî çîrokên periyên beşdarî li çêbûna edebiyata romantîk kiriye. Ji aliyê din ve navên wekî Sînbad, Şehrazad di xêzefilmên bo zarokan da li karakteran hatine danîn ku berbelaviya tesîra wergêranê di qadên din da berbiçav dike (Sakallı, 2014: 199-204; Aytaç, 2009: 43-44).

Wergêranên di dema Osmanî û Komara Tirkîyeyê da hatine kirin, mînakên gelek di cih da ne ku mirov dikare wek xalên werçerxê bihesibîne di sîstema çand û edebiyata tirkî da. Berî destpêkirina bizavên wergêrana tirkî, di astên cuda da her sê xalên Even-Zohar destnîşankirî hebûn di warê edebiyat û çanda tirkî da ku wergêran pêwîst dikir. Bi îlankirina Tanzîmatê ra rûyê sîstema çand û edebiyata tirkî ber bi Rojavayê ra guherî û pê ra rê li ber nûjenîyan vebû. Lêbelê berî wê di dema Laleyê da bi piranî di warên teknîkî û leşkerî da bizava wergêranê dest pê kiribû. Civakê cara ewil di sedsala 19an da di dema Tanzîmatê da cureyên edebî yên edebiyata Rojava yên wek roman, rexne, gotar, çîroka hevdem, şano, helbesta modern û hwd. –em dikarin bibêjin hemû cureyên edebiyata modern- bi rêya wergêranê nas kir. Wê demê “edebiyateke wergêranê” çêbûye û cureya herî popûler, herî wergêrayî û hezkirî roman bûye. Bi rêya wergêranên cureya romanê di serî da ji fransîzî û piştê ji zimanên din ên Ewrûpî, civaka osmanî ev cure xwendine û jê hez kirine. Demeke şûn da wergêran ku ev roman wergêrane, berhemên wergêrayî teqlîd kirine û romanên telîf nivîsandine. Bi vî rengî roman ewil bi tercumeyê hatiye naskirin û hezkirin di nav gel da, dûre li gor hêvî û daxwazên xwîneran berhemên telîf hatine weşandin ku teqlîdên romanên wergêrayî bûn (Karadağ, 2019: 10). Tecrubeya naskirin û bicihbûna cureyên din ên edebiyata modern jî bi vî rengî bûne. Di dema Tanzîmatê da bo wergêranê di bijartina berhemên da bi piranî pîvanên wek “sûdewarbûn”, “fêrdarî”, “popûlerbûn”, “kêfxweşkerî” hatine berçavkirin (Bay Gülveren, 2019: 54-56). Ligel guherîn û veguherînên edebî li ser veguherîn û geşedanên çandî û civakî jî wergêran gelek karîger bûye, di modernîzasyona Tirkîyeyê da roleke sereke dîtîye. Di vê peywendê da wergêranên di salên 1940î da li Komara Tirkîyeyê hatine kirin, dikare wek berdewamiya bizava Rojavayîbûnê bîn dîtin ku di Tanzîmatê da bi wergêranên edebî û yên qadên din dest pê kiribûn. Di çarçoveya bizava wergêranê ya salên 1940î ya di bin pêşengî û qontrola wezîrê perwerdeyê Hasan Âli

Yücel da, ji edebiyata cihanê –bi piranî ji edebiyatên Rojavayî, hejmareke pir kêr ji edebiyatên Rojhilatî- berhemên klasîk hatine wergêran û tevî şoreşa zimên û enstîtûyên gundan bingehên pêvajoyeke ronakbûnê hatiye danîn. Wan wergêranan di xurtbûn û standardîzasyona zimanê tirkî, dewlemendbûn, şewegirtin û pêşveçûna edebiyat û çanda tirkî da roleke şoreşgerî girtiye ser xwe. Wergêranên wê demê yên ji edebiyatên cihanê, bi tenê li ser edebiyata tirkî karîger nebûne di heman demê da bûne sedema pêşveçûn û veguherînên bingehîn ên çandî, fikrî, siyasî û civakî jî (bnr. Özyön, 2019; Karadağ, 2019; Bay Gülveren 2019). Ev veguherînên piralî ji aliyekî ve di modernîzasyona Tirkîyeyê da bûne faktoreke giring, ji aliyê din ve ji bo xurtbûna edebiyata tirkî bûne zemînekî fikrî. Jixwe pîvanên wergêranên wê demê –ku wekî li jor hate gotin bi piranî klasîk û şaheserên Rojavayê bû- armanca wê jî eşkere dike. Armanca, mîna dema Ronesansê ya li Rojavayê, di çarçoveya çandî da sazîkirin û pêşvebirina humanîzmê bû. Digel vê dihat armanckirin ku di warê çandî û ramiyariyê da civaka tirk bihata serwestîkirin û ronîkirin (Özyön, 2019: 35-36). Dikare bê gotin bi xwendin û hezkirina berhemên wergêrayî ji aliyê civaka tirk ve heta asteke bilind armancên plankirî hatine bicîhkirin.

Bizavên wergêranê yên farisî û rol û karîgeriya wan li çand, civak û edebiyata farisan jî dikare di vê çarçoveyê da bê nixandîn. Serboriya modernîzasyon û beşdariya wergêranê di pêvajoya modernîzasyona Îranê da di destpêkê da dişibe ya tirkan. Di serdema Xanedana Qacar (1772-1834) da bi taybetî Ebbas Mîrza, Nasirüddîn û sedrazam Emîr-î Kebîr eleqe û giringiyê zêde dane faalîyetên wergêranê. Pirtûkên li ser sîstema artêş û leşkeriyê, biyografîyên hikûmdarên navdar, dîrok, cografya, tib, felsefe û edebiyatê hatine wergêran. Daîreya wergêranê hatiye vekirin, dersên zimanên wek îngilîzî, fransîzî, osmanî û rûsî hatine dayîn, wergêran hatine îstîhdamkirin, wergêran hatiye teşwîqkirin, lîsteyên pirtûkan hatine çêkirin û ji Rojava hatine sîparîşkirin bo wergêranê, çapxaneyêke taybet bo wergêranê hatiye vekirin. Bi kurtî ji aliyê dewletê ve plan û proje hatine çêkirin bo faalîyetên wergêranê. Balkêş e, Nasirüddîn Şah bo ku ji geşedanên cihanê haydar be rojname jî dane wergêran. *Rojnameya Independet*, ya *Saint Petersburg*, rojnameyên Osmanî û Ereban bo Şah hatine wergêran. Herweha wê demê 61 kovar jî hatine wergêran bo farisî. Di vê serdemê da wergêrana hemû berhemên edebî ji fransîzî hatine kirin û yên der-edebî yên teknîk û biyografîk piranî ji îngilîzî hatine kirin –tercîha zimanê jêder ê wergêranên tirkî yên dema Tanzîmatê jî bi giştî wiha bû-, herweha ji zimanên wek osmanî, rûsî jî wergêran hatine kirin (Xusrewbeygî & Feyzî, 1391: 125-146; Karadeniz, 2012: 178-191). Li Îranê piştî serdema Qacar, di serdema Pehlewî (1925-1979) da hêdî hêdî tevgerên çepgir xurt bûne bi bandora Sovyetê. Cimaetên çepgir wê çaxê ji aliyê zanistên modern ve pir xurt bûne. Van cimaetên çepgir dest bi wergêranê kirine û bi piranî edebiyata rûsî wergêrane. Bi gelemperî wergêrana berhemên nivîskarên rûs û Sovyetê yên wek Sholokhov, Gorky, Tolstoy, Dostoevsky, Gogol, Chekhov, Zamyatin hatine kirin. Herwekî din di derdora salên 60-70yî da berhemên li ser şoreşgeriyê yan yên derbarê fikrên newekhevî û şoreşê da yên nivîskarên wek George Orwell, John Steinbeck hatine wergêran. Di vê demê da %66ê wergêranan, edebî ne. Ji bilî yên edebî wergêrana pirtûkên îdeolojîk ên derbarê civak û polîtîkayê da jî hatine kirin. Hin pirtûkên îdeolojîk bêyî navê berhemê û wergêr, bi bergên spî hatine weşandin û belavkirin. Ji ber vê wek *Pirtûkên Spî* hatine binavkirin. *Pirtûkên Spî*, di dîroka weşangeriya Îranê da navdar in. Ev pirtûk li pirtûkfiroşan nedihatîn firotin, pirtûkên destfiroş bûn di tezgahan da. Lewra di dema Pehlewî da pirtûk dihatin çapkirin, lêbelê hema piştî çapkirinê dihatin qedexekirin ku berhemên wergêranê jî ji vê rewşê ne azade bûn. Di roja îroyîn da jî ji deriyên sansûrê derbas nabin, lê dîsa bi awayekî pirtûkên qedexe tên firotin. Di destpêka Şoreşa Îslamê da, di 1980an da bi tevayî 421 pirtûk hatine weşandin, lê di 1981an da di şûna ku zêde bibe jimar dikeve 354an. Tevî vê bizava wergêranê li Îranê di Komara Îslamî da jî xurt bûye. Di 1991ê da li Îranê nisbet tirkî û misrî, bi farisî bêtir wergêran hatine kirin. Wergêrana tirkî ji destpêkê ve heta avabûn û xurtbûna weşanxaneyên taybet hertim ji aliyê dewletê ve hatiye destekkirin, finansîkirin û teşwîqkirin. Lê wergêrana farisî ji xeynî dema Qacar ji aliyê gel ve hatiye kirin, ji dema Pehlewî heta hingê dewletê piştgirî nedaye geşedana bizava wergêrana farisî, berevajî ew qedexe kiriye. Ligel vê bi giştî li Îranê bizava wergêranê gelek xurt bûye (bnr. Azereng, 1378 (1991): 230-231; Azereng, 1400 (2021)).² Bêguman e ku karîgeriya wergêrana farisî li ser bizavên civakî û siyasî yên Îranê hebûye û beşdariya wergêranê di însa û geşedana sîstema edebiyata farisî ya modern çêbûye. Di dewleteke wek Îranê ya navxweyî da yek ji serkaniyên serwestker wergêran e ku civakê ji geşedanên

² Pêwîst e ku bê destnîşankirin di vê xebatê da ji hemû çavkaniyên farisî em bi rêya xwendin, şrove û ravekirinên birêz Shahab Vali sîdewar bûn. Ji bo ked û alikariya wî em spasdarê Shahab Vali ne.

cîhanê hayedar dike û fikra nûjeniyên şîn dike. Li aliyê din du pêşengên edebiyata farisî ya modern, Sadiq Hidâyet û Ahmed Şamlu, dikare wek mînak bîn destnîşankirin bo kartêgeriya wergêranê li ser çêbûn û geşedana edebiyata Îranê ya modern. Di vê peywendê da Sadiq Hidayet, li Fransayê maye; bi fransî, hindî û îngilîzî dizanîbû, bi taybetî li ser edebiyata Rojava û wergêranê xebitiye. Ahmed Şamlu jî bi îngilîzî, japonî, swêdî, fransîzî dizanîbû û gelek berhem wergêrane. Baldariya wan a li ser edebiyata Rojava û wergêranê, zanîna zimanên biyanî û wergêrana berhemên giring ên edebî, bivênevê li ser nivîskariya wan û –ji ber ku wek şexsiyên avasaz tînan zanînan– di destpêka edebiyata farisî ya modern da tesîrdar bûye. Herweha tesîra berhemên wan wergêrayî û berhemên wan ên telîf li ser nivîskarên farsî û geşedana edebiyata farisî çêbûye ku dikare wek tesîra tesîrê bê şîrovekirin.

3. Wergêran û Edebiyata Kurdî

3.1. Armanca û Pîvanên Wergêrana Kurdî

Sedema sereke ya kiriyara wergêranê pêwîstî ye, bi gotineke din dagirtina valahiyan e di qadên ciyawaz da yan jî bersivdayîna bendewarî û daxwazên xwîneran e. Lêbelê di rewşa kurdan da armanca wergêranê wateyeke xwe ya din heye. Nikare bê gotin wergêrana kurdî, ji ber bendewarî û eleqeya xwîneran tê kirin, wergêranên kurdî zêde tînan xwendin yan weşanxane û wergêr ji bona qezencê wan werdigerînin. Ya rastî xwendina pirtûkên kurdî yê telîf ne ewqas zêde ye ku nivîskar yan weşanxane pê debara xwe bikin û nivîsandinê ji xwe ra bikin kar. Xwendin û firotina wergêranên kurdî hîn kêmtir e. Wergêrana kurdî wek hemû qadên kurdî, ne ji “pêwîstî”, “bendewarî” yan “rewacdîtin”ê, lê bêtir bi armanca û ajoyên politîkî tê kirin. Wekî hemû kar û xebatên bi kurdî, heta niha armanca esasî ya wergêrana kurdî, esasen parastina zimanê kurdî bûye. Piştî vê armancê wek îsbatkirina karî û dewlemendiya kurdî, hêza vegotina kurdî, qabiliyet û qapasîteya kurdî, nekêmbûna kurdî ji tu zimanên din, rûmetdayîna kurdî û armancê bi vî rengî dikare bîn rêzkirin ji bo kirina wergêrana kurdî (Kan, 2023: 476-477). Dema li hin xebatên derbarê wergêrana kurdî bê nêrîna ji hin pênaseyên bo wergêranê hatine kirin, armanca wergêrana kurdî berbiçav dibe. Yanî di wan pênaseyên wergêranê da bersiva wê yeke tê bidestxistin ka çima wergêrana kurdî tê kirin yan jî divê bê kirin. Bêje û pênaseyên wekî “raperîneke neteweyî” (Nebez, 2021: 21); “îmkanên berxwedana” zimanî, “li dijî asimilasyonê ... kelehek e”, “star”, (Aydoğan, 2001: 191, 203, 204); “xweîsbatkirin” (Töre, 2015: 53) dide diyarkirin ka wergêrana kurdî çî rol, giringî û armanca xwe heye yan jî çima pêwîst hatiye dîtin.

Di wergêrana kurdî da pîvanên bijartina metna ji bo wergêranê bi piranî ne li gor plan û projeyekê bûne, lêbelê bi giştî li gor helwesta şexs yan saziyan guhêrbar bûne. Yanî mirov dikare bibêje ku bijartina berhemên bo wergêranê di kurdî da hinek tesadûfî ye. Lêbelê berbiçav e ku giraniya wergêrana kurdî li ser berhemên edebî ye, di kurdî da wergêrana berhemên der-edebî pir kêmtir e. Öpenginî di gotareke xwe da destnîşan kiriye ku ji 211 pirtûkên di navbera salên 1980 û 2009an da wergêrayî, 179 heb berhemên edebî û yê mayî, yanî bi tenê 32 heb wergêranên der-edebî ne (2011: 9). Yek ji sedemên herî berbiçav ên vê rewşê ew e ku piraniya wergêranên kurdî di heman demê da nivîskar in. Lewre normal e ji bo wergêranê jî bala wan li ser berhemên edebî be.³

Tevî ku pîvanên wergêrana kurdî li gor plan û projeyan nehatibe diyarkirin û bi piranî bijartina berhemên bo wergêranê girêdayî daxwaz û eleqeyên şexsî yê wergêran be jî ji aliyê hin wergêran ve bi taybetî wergêrana berhemên herî nixrdar û dijwar ên cîhanê bi xwe bûye pîvanek. Bo nimûne wergêrana yek ji berhemên cîhanê yê herî dijwar –*Ulysses*– li kurdî vê angaşte erê dike ku di hin zimanên lê wergêrayî da ferhengên xisûsî bo wê hatine amadekirin. Ev û mînakên din ên hevring diyar dike ku bi wergêrana berhemên nixrdar û dijwar wergêranên kurdî armanca dikin hêz, dewlemendî û potansiyela kurdî bînin ber çavan.

3.2. Geşedana Hevterîb a Wergêran û Edebiyata Kurdî ya Modern

³ Nebûna ferhengên termînolojiyê di qadên ciyawaz da, kêmeleqeya xwînerên kurdî ji bo metnên teorîk û teknîk, endîşeyên aborî yê weşanxaneyên kurdî û rewşa piyasayê, tirs û endîşeyên derbarê potansiyela kurdî da ûhwd. dikare wek sedemên din bîn hesabandin ji bo rewşa heyî (bnr. Yıldırımçakar, 2021: 76-77).

Wergêran amrazek e bo wergirtin û geşepêdana mînakên nû yê edebî. Bi saya wergêrana berhemên edebî, taybetmendiyên nû dikevin nav edebiyata neteweyî wek modelên nû yê edebî, şeweyên vegotîneke nû, zimanekî nû, mijar û karakterên nû, şêwe û teknîkên nû û hwd. Li gor Even-Zohar dema wergêran di navendê da be, bi awayekî aktif beşdariyê li şewedana polisistema edebiyatê dike (1990: 46-47). Di mînaka edebiyata kurdî da beşdariya çalakiya wergêranê di derçûn û geşedana polisistema edebiyatê da nisbet edebiyatên neteweyî yê xwedî dewlet hinek cuda ye. Ji ber ku kurdên hemû perçeyan herî kêr du-zimanî ne jixwe dikarin edebiyata cîhanê ji zimanên serdest bixwînin, guherîn û veguherînên edebî bişopînin. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin xwîner û nivîskarên kurd berhemên edebiyata cîhanê, şeweyên cuda yê zimanê edebî, têgihîştin/feraset, cure û teknîkên nûjen yekser bi wergêranên kurdî nas kirine/dikin. Zîra berî wergêrana kurdî jixwe yan yekser ji zimanê resen yan bi rêya wergêrana zimanên serdest hay ji berhemên edebiyata cîhanê, taybetmendiyên wan ên cureyî û zimanî hebûn/dibin.

Ji aliyê din ve serborî û geşedana edebiyata kurdî ya modern û wergêrana kurdî bi giştî hevterîb e, herweha armanc û daxwazên wan jî wekhev in (bnr. Yıldırımçakar, 2021: 76). Di perspektîfeke berfireh da nişandana dewlemendî û besatiya kurdî, helwesteke li dijî polîtîkayên bişaftinê û rêlibergirtina qelsbûn û tunebûna kurdî, parastin û pêşvebirina zimanê kurdî dikare wek armanc û daxwazên hevpar ên edebiyata kurdî ya modern û wergêrana kurdî bîn dîtin. Diyar e armancên her du qadan bêtir polîtîk û zimanî ne. Di çarçoveya giştî da wer xuya ye her duyan bi hev ra beşdarî bêtir li parastin û geşedana sîstema zimanî kirine. Digel vê herçiqas endîşeyên polîtîk-zimanî li pêş be û beşdariya wergêranê di çêbûn û edebiyata kurdî da wek bizaveke biplan û biproje berçav nebe jî, em dikarin bibêjin îşaretên beşdarî û kartêgeriya wergêranê li ser edebiyata kurdî bi piranî di şexsiyeta wergêr/nivîskarên da tê dîtin. Wergêrana kurdî, di çarçoveya dewlemendkirina sînor û derfetên zimanê kurdî da ku pêşgava sereke ye bo avakirina edebiyatê û di çarçoveya ceribandin û pratîzekirina cure, teknîk, şeweyên nû yê vegotîne da wergêr bo nivîskariyê amade kirine û bi vî rengî beşdarî li geşedana edebiyata kurdî ya modern kiriyê.

Di mînaka edebiyata kurdî ya Sovyetê da herçiqas wek bizaveke pir xurt û domdar nebe jî, dikare bê gotin wergêran biyê bîngehek di derçûna edebiyata kurdî ya wê qonaxê da. Di vê qonaxa edebiyata kurdî da em dibînin nivîskarên kurd, berî berhemên telîf xwe di wergêranê da ceribandine. Wergêranên vê qonaxê piştî hin wergêranên Mela Mehmûdê Bazîdî, di warê kurdî da nimûneyên ewil ên wergêrana edebî ne. Di navbera salên 1931 û 1937an da ji edebiyata rûsan û ermeniyên gelek berhem hatine wergêran. Ev wergêran bi piranî ji aliyê nivîskarên wek Erebe Şemo, Heciyê Cîndî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Ruben Drampyan, Qaçaxê Mirad, Cerdoyê Genco ve hatine kirin ku hinekan ji wan di warê edebiyata kurdî da berhemên ewil ên telîf jî nivîsandine. Bo nimûne Erebe Şemoyê yekem romannûsê kurd, di 1931an da piyeseke bi navê *Koçekê Derewîn* diweşîne ku berhema ewil a edebî ye di vê qonaxê da. Ev berhem, adaptasyonek e ji berhema nivîskarê ermen Aleksandr Araratyan. Herwekî din nivîskarê pîralî û berhemdar, Heciyê Cîndî, di 1931-1978an da wergêrana 15 berhemên ji warên ciyawaz kiriyê. Di 1931an da ji Lazo/Agop Xazaryan berhevokeke çîrokan a bi navê *Serhatiya Casim* ligel Emînê Evdal wergêraye. Herweha ji H. Salçiyân şanoyeke bi navê *Rêya Teze* (1934) û piyeseke bi navê *Ser Riya Dewlemendiyê* (1935),⁴ ji Sîras çîrokeke dirêj (novel) bi navê *Memê û Eyşê* (1935) wergêraye. Li aliyê din Qaçaxê Mirad ji nivîskar û helbestvanên wek Puşkîn, Gorkî, Mayakovskî, Lermantov, Nekrasov berhemên edebî wergêrane, *Pilênê Kavkasê* ji Lev Tolstoy wergêraye kurdî; Cerdoyê Genco, di 1936an da *Robînzona Daniel Defoe* kiriyê kurdî.⁵ Di salên 1960î da jî kesên wek Emerîkê Serdar, Egîdê Xudo, Wezîrê Eşo, Fêrikê Êsiv û yê din wergêranên edebî bo kurdî kirine (Ergün, 2023: 24-25; Yılmaz, 2021: 44-45; Reşit, 2012: 204/210). Wergêran herçiqas veguhestin/neqilkirineke zimanî be, ji aliyê din ve veguhestin/neqilkirina tecrubeya nivîskariyê ye. Bi wergêrana metnên edebî, ne ku bi tenê vegotînek, şeweyek yan naverokek ji zimanekî vediguhêze yekî din; di heman demê da tecrube -belkî heta derekê afirînerî, dahênerî û berhemanîna nivîskarê berhema

⁴ Di nava xebatên kurdên Sovyetê da şano û piyeseke cihekî xwe yê taybet heye. Pareke mezin a piyeseke ku dihatin sehnekirin yan wek radyoşano dihatin pêşkêşkirin ji zimanên wek rûsî, ermenîkî, gurcîkî, azerî dihatin wergêran. Ji demekê şûn da nivîskarên kurd jî piyeseke nivîsandine ji bo şano yan radyoyan. Ji bo agahiyên zêdetir derbarê xebatên şano û radyoşanoyên kurdî di dema Sovyetê da (bnr. Kaya, 2022: 38-46).

⁵ Ji bo listeya wergêranên kurdî yê di destpêka qonaxa edebiyata kurdî ya Sovyetê da hatine kirin bnr. (Ergün, 2023: 24-25).

jêder- vediguheze wergêr. Lewra wergêr, berhema jêder di zimanê xwe da ji nû ve diafirîne û dinivîsîne. Lewma jî em dikarin wergêrên berhemên edebî wek ve-nivîskar û ve-afirîner binirxînin.⁶ Ya rastî, mirov dikare wan wek wergêr-nivîskar bi nav bike ji ber ku temsîlkarên nivîskarê berhema jêder in. Li Yekîtiya Sovyetê berî berhemdayîna berhemên telîf kiriyara xebatên wergêrana kurdî dikare wek pêşgavên amadekariyê bîn hesabandin bo nivîskariya kurdî û derçûna mînakên ewil ên cureyên modern di edebiyata kurdî da. Wek vekolerên qadê destnîşan kirine, mirov dikare bi rihetî bibêje ku edebiyata kurdî ya Sovyetê li ser bingeha wergêranan ava bûye. Di berhemên kurdî yê ve qonaxê da ji aliyê zimanî û edebî ve tesîreke xurt a rûsî û ermenîkî tê ber çavan. Di edebiyata kurdî ya Sovyetê da berçavbûna tesîra şeweyî, naverokî û zimanî –bêtir wergirtina peyvên û hevoksazî- ya van ziman û edebiyatên behskirî dikare bi wergêranê bê şîrovekirin (Reşît, 2012: 204/ 206-207).

Dema ku li Yekîtiya Sovyetê di çarçoveya piştewani û derfetên desthilatdariyê da xebatên kurdî yê çandî û edebî bi lez û bezê berbiçav dihatin kirin, li mêtîngeha fransîzan a wê demê, Sûriye, da jî bi piştewaniya fransîzan bingehên yek ji qonaxên herî giring ên edebiyata kurdî dihat avêtin (bnr. Kan, 2023: 480-483). Herçend di kovara *Hawarê* da çendîniya wergêranan ne ewçend zêde be jî nivîskarên ve qonaxê hay ji giringî û pêwistiya wergêranê hebûne. Nûnerên *Hawarê* wergêran wek amrazê serwestbûn, hayjêbûn, ‘bi çavêkî din dîtin’, danasîna çand û wêjeyên din, yekgirtî û geşedana kurdî -yanî standardîzasyona kurdî- dîtine. Celadet Bedir-Xan ji bo dîtina fikr û nêrinên biyaniyan ên derheqê kurdan da, Elî Seydoyê Gewrî jî ji bo bi rêya wergêrana berhemên nixdar ên biyanî bidestxistina yekgirtî û geşedana kurdî pêwistiya wergêranê destnîşan kirine (Bedir-Xan, 1998: 383-384; Gewrî, 1998: 447). Ji xeynî destnîşankirina pêwistiya wê, pratîkên wergêranê jî di *Hawarê* da hatine dayîn: Nureddîn Zaza, Kamiran Alî Bedirxan, Celadet Alî Bedirxan, Qedrîcan û Osman Sebrî berhemên biyanî wergêrane yan ew adapteyî kurdî kirine. Kamiran Bedir-Xan, wergêrana metnên pîroz û çarîneyên Xeyam kirine. Celadet Bedir-Xan, berhemêke çîrokên a bi navê *Conî û Cîmema* wergêraye û hinek çîrok adapteyî kurdî kirine. Nureddîn Zaza jî bi adaptasyonên serketî yê çîrokên tê zanîn. Herwekî din herçiqas yekser adapte nekiribe jî di hinek çîrokên Qedrîcan da bandoreke xurt a Ömer Seyfettin heye. Çîrokên *Hawarê* nimûneyên ewil ên çîroka kurdî ya hevdem in, lê digel ve çîrokên gelek serketî ne. Di ve yekê da bêguman mijûliya nivîskaran a bi wergêrana edebî û adaptasyonê ra karîger e. Hinek nivîskarên *Hawarê* navê leheng, cih, dem û hwd. guherandine û li ser nimûneya çîrokeke biyanî çîroka xwe nivîsandine. Wan ruhê kurdî, li cure, şewê, teknîk, mijar û lehengên deynkirî anîne ku berbiçav dike bi rêya cureyê wergêranê -adaptasyon- taybetmendiyên nû yê wergêranê daxilî edebiyata kurdî bûne. Bi vî rengî di *Hawarê* da bingehêke xurt hatiye danîn bo çîroka kurdî ya hevdem.⁷

Piştî edebiyata kurdî ya Sovyet û *Hawarê*, temsîlkarên edebiyata kurdî ya Swêdê jî bala xwe dane ser wergêranê û xasma giringiya wê destnîşan kirine ji bo edebiyatekê astbilind. Ji nivîskarên pêşeng ên ve qonaxê Mehmed Uzun di hevpeyvînekê da amaje bi giringî û rola wergêranê di dewlemendkirin û xurtkirina zimên, însa û geşedana edebiyatê da kiriyê. Ji bo rastdêrana gotinên xwe tecrubeyên tirk, fars û ereban dane ku mînakên guncan in ji bo teoriya polisîstemê. Uzunî vegêraye ku wergêran dê ji bo kurdan jî bibe zemîneke giring di xurtbûn û aktîfîbûna kurdî û nivîsandina berhemên telîf da. Herî dawî behs ji destpêşxeriya xwe kiriyê ku di wergêrana hin metnên edebiyata cîhanê da xwe ceribandîye (Uzun, 2002: 129-130). Nivîskarên din ên qonaxê jî giringiyêke zêde dane çalakiya wergêranê û xwestine bizaveke wergêranê bidin destpêkirin. Lewma yekem kovara kurdî ya wergêranê -*Nûdem Werger*- derxistine û herweha berhemên nivîskar û helbestvanên giring ên cîhanê wergêrane kurdî. Herçiqas bi tenê jimareke kovara *Nûdem Wergerê* hatibe weşandin û berhemên cîhanê bi giştî ne ji zimanê resen, ji wergêrana zimanekî din hatibin wergêran jî mijûliya bi wergêranê, di avakirin û

⁶ Li gor wergêrannasê navdar André Lefevre wergêran, *venivîsandin* e (bnr. 1992), yanî wergêr metn yan berhema heyî ji nû ve nivîsîne. Di ve rewşê da wergêr dibe *yê/a ji nû ve dinivîsîne* û *yê/a ji nû ve diafirîne*.

⁷ Divê bê diyarkirin ku di ve xebatê da me bi tenê di peyvên karîgeriya wergêranê da behs ji wergêranên kurdî kiriyê, me bi giştî behsa wan wergêranan kiriyê ku ji aliyê wergêrên kurdî ve hatine kirin ku di heman demê da nivîskar in û berhemên telîf jî nivîsandine. Herweha behsa wan wergêranan kiriyê ku di destpêkên qonaxên edebiyata kurdî da hatine kirin û kêmasiya nebûna berhemên telîf dagirtine û bandor li ser xwînerên kurdî hiştine ku hinekan jê dûre bi xwe jî di wergêran û nivîskariyê da xwe ceribandin. Loma di xebatê da diroqçe yan kronolojiyê wergêrana kurdî nîne. Ji bo çend xebatên li ser diroqçeya wergêrana kurdî bnr. (Öpengin, 2011; Yıldırımçakar, 2021; Taştan; 2019; Kan, 2023).

xurtkirina zimanekî edebî, veguherîna edebiyata tradîsyonel ber bi ya modern ve, beşdarîbûna li edebiyata cîhanê, derxistina zimanê kurdî ji şêweya folklorîk a bisînor, xurtkirin û dewlemendkirina zimanê kurdî, wergirtina teknîk û cureyên nû yê edebî da karîger bûye. Jixwe nivîskarên kurd ên Swêdê ji bo van karîgeriyên wê yê li ser ziman û edebiyatê giringî dabûn çalakiya wergêranê û xalên behskirî di pêşgotina *Nûdem Wergerê* da wek armancên kovarê eşkere kiribûn (1996: 4-5). Dikare bê gotin hingê berhemên ji edebiyata cîhanê jî bi heman armancan hatine wergêran ji aliyê nivîskarên vê qonaxê ve. Diyar e nivîskarên kurd ên Swêdê, wergêrana edebî, wek pêş-nivîskarî û qada ceribînekê dîtine berî destpêka nivîsîna berhemên telîf û berî nivîskariyê xwe di ve-nivîskariyê/wergêriyê da ceribandine yan jî karên wergêrî û nivîskariyê bi hev ra meşandine. Di mînakê nivîskarên kurd ên Swêdê yê wek Firat Cewerî û Hesenê Metê da ev rewş berçav e. Di serî nivîskariya xwe da van nivîskaran berhemên edebî wergêrane, mihtemelen pratika nivîsîna bi kurdî ewil di warê wergêranê da ceribandine û hingê berhemên telîf nivîsîne.

Herkesê ku li ser wergêrana kurdî bixebite dê karibe bi rihetî bibîne wergêrana kurdiya Bakur (kurmancî) bi taybetî piştî 2000an ketiye nava geşedaneke berbiçav hem ji aliyê çendanî û hem jî ji aliyê çawaniyê ve.⁸ Hem jîmara wergêranên kurdî zêde dibe piştî 2000an û hem jî wergêrên kurd bi awayekî jixwebawer –helbet ji dewlemendiya vegotina kurdî jî bawer- berê xwe didin wergêrana berhemên herî nîrxdar û dijwar ên cîhanê. Di wergêrana kurdî ya piştî 2000an da jî geşedana hevterîb a edebiyata kurdî û wergêranê, hevkarigeriya wergêrî û nivîskariyê berdewam e. Eger em bala xwe bidin wergêrên kurd ên piştî 2000an dê bibînin ku wergêrên herî navdar û serketî di heman demê da di warê edebiyata kurdî ya modern da nivîskarên sereke û giring in. Ev rewş fikrên teorîsyenê polisîstemê, Even-Zohar piştrast dike ku diyar dike: Di rewşên ku wergêran di navendê da be wergêr dibe perçeyekî nûjeniyê, wergêrên berhemên giring û berçav wergêrayî di heman demê da nivîskarên pêşeng û sereke ne. Herweha Even-Zohar angaşt dike ku di rewşên wiha da ferqa di navbera berhemên “wergêrayî” û yê “resen” da kêm dibe (1990:46). Di vê peywendê da wergêrên kurd ên piştî 2000an, bo nimûne Kawa Nemir, Ciwanmerd Kulek, Dilawer Zeraq, Lal Laleş di heman demê da nivîskar/helbestvanên herî navdar û sereke ne di warê edebiyata kurdî ya modern da. Dilawer Zeraq û Lal Laleş, di çarçoveya rêzewergêrana *Cervantes* da ji tirkî berhemên nivîskar û helbestkarên hevdem wergêrane kurdî. Di heman demê da Dilawer Zeraq, bi roman û çîrokên xwe yê telîf nivîskarekî giring e qonaxa edebiyata kurdî ya Bakur e; Lal Laleş jî yek ji helbestvanên herî navdar û giring e heman qonaxê ye û di heman demê da di warê weşangeriya kurdî da navekî pêşeng e. Laleş xwediyê weşanxaneya *Lîsê* ye ku bi sedan pirtûkên kurdî weşandine û herweha di warê wergêrana kurdî da xwedî projeyê demdirêj û berfireh e.

Herwekî din wergêranên Ciwanmerd Kulek û bi taybetî yê Kawa Nemir, ji yê herî navdar in di nav wergêranên kurdiya Bakur (kurmancî) ên piştî 2000an da. Ciwanmerd Kulek, ji zimanên îngilîzî, îspanyolî û tirkî berhemên giring ên edebiyata cîhanê wergêrane kurdî ji nivîskarên wekî J. M. Coetzee, W. Faulkner, G. G. Márquez, Jorge Luis Borges, J. Joyce, Juan Rulfo, Orhan Pamuk, Mario Vargas Llosa, R. L. Stevenson. Bêguman ne tenê di wergêrana kurdiya Bakur (kurmancî) da herweha di dîroka giştî ya wergêrana kurdî da wergêrê herî berhemdar Kawa Nemir e. Dikare bê gotin Nemir pêşengê wergêrana kurdî ye, ew bi xîretkêşiya xwe wek bûroyeke wergêranê xebitiye. Wî gelek çîrokên hevdem, helbest, şano û roman ji edebiyatên îrlandî, amerîkî û îngilîzî wergêrane kurdî. Nemir heta niha 7000 helbest wergêrane, wergêrana 100 pirtûkî kiriye lê bi tenê hinek jê hatine weşandin (bnr. Bayram, 2019). Wî berhemên W. Blake, J. Berger, Shakespeare, W. B. Yeats, E. Dickinson, Herman Melville, E. Pound, Oscar Wilde, James Joyce, W. Whitman, Migirdiç Margosyan, T. S. Eliot wergêrane kurdî. Wergêranên wî yê herî navdar *Hemû Soneyên William Shakespeare* û *Ulysses* J. Joyce ye. Nemir wergêrana Shakespeare wek “şoreşeke biçûk” (Nemir: 2010) û ya *Ulysses*ê jî wek “şerê giran e bi salan” (Kayi,

⁸ Berî wê di salên 1990an da di sê kovarên kurdî yê bi navên *Rewşen*, *Jiyana Rewşen* û *Rewşen-Nameyê* da em rastî hin mînakên wergêrana kurdî tî. Bi taybetî di *Rewşen-Nameyê* da kiriyara wergêranê çalak bûye. Tê dîtî wergêrên hingê bi giştî ne bi navên xwe yê fermî, lê bi nasnavên kurdî wergêrî kirine (bnr. Zeraq, 2022) Lêbelê hin kesên di kar û barên wan kovaran da çalak bûne -wek Dilawer Zeraq- didin zanîn ku kesên wek Kawa Nemir, Dilawer Zeraq, Yaqop Tilermenî, Lal Laleş, Samî Hêzil hin ji wan wergêran e. (Em spasdarê Dilawer Zeraq in ji bo vê agahiyê). Tê famkirin ku bingeha wergêriya van kesan di kovarên behskirî –bi taybetî *Rewşen-Name-* da hatiye danîn. Jixwe di wergêrana kurdî ya piştî 2000an da jî Nemir, Zeraq û Laleş çalak in û di ber ra berhemên telîf weşandine. Herweha Samî Hêzil jî di wergêrana kurdiya Bakur (kurmancî) a piştî 2000an da bêtir çalak bûye.

2023), wergêrê wê, yanî xwe jî wek “şervanekî demdirêj” (Gültekin, 2023) bi nav dike. Ev pênasaya bi vî rengî, amaje bi dijwariya wergêrana van metnan, bi taybetî ya *Ulyssesê* dike ku ji metnên herî dijwar ên cîhanê tê hesibandin û di pêvajoya wergêrana wê ya kurdî da gelek gengeşî hebûne derbarê nemimkîniya wergêrana wê da (Gültekin, 2023). Bi kurtî her du nivîskar/helbestvanên navborî bi qasî wergêriya xwe bi nivîskarî/helbestvaniya xwe jî li pêş in. Ciwanmerd Kulek di warê romana kurdî ya modernîst/postmodernîst da û Kawa Nemir di warê helbesta kurdî ya modern da di nav nivîskar û helbestvanên pêşeng da ne. Divê bê gotin berhemên wergêrayî û yên resen ên van nivîskar/helbestvanan bi taybetî ji aliyê terz û bikaranîna zimên ve gelek dişibin hev, yanî ferqa di nav wan da kêm e.

Di mînaka Kulek, Nemir, Zeraq û Laleş da gelo dikare bê gotin ku wergêranên kirî li ser nivîskarî û helbestvaniya wan tesîr nekiriye? Bivênevê wergêranên kirî, li ser bikaranîna zimên, teknîk, terza wan a nivîsînê karîger bûye. Eger em wergêr wek temsîlkarê nivîskarî di zimanekî din da qebûl bikin –ku wiha ye- dê têbigihîşin ku van wergêran nivîsîna berhemên biyanî tecrube kirine û di şopa rêyên tecrubekirî da berhemên xwe berhemaniye. Bo nimûne wekî gavek berê amaje pê hate kirin di navbera berhemên ku Ciwanmerd Kulek wergêrayî û berhemaniya wî ya edebî da pêwendiyê eşkere heye. Ne tesadûfî ye ku Kulek romanên modernîst/postmodernîst werdigerîne û bixwe jî bi wê terzê romanên kurdî dinivîsîne. Berbiçav e ku tesîra terz, teknîkên fîksiyon û vegotinê, bikaranîna zimên ê van wergêranan li ser nivîskariya Kulek çêbûye. Mesela Kulek di romanên xwe da ji bo berfirehkirin û xurtkirina vegotinê zêde zorê dide sînoren zimên, hevokên gelek dirêj û kompleks saz dike ku digel ji aliyê hevoksaziyê ve rast bin jî bo kurdî xerîb in. Bi ya me ev, bi nasîn û xwendina edebiyata cîhanê, zanîna zimanên biyanî û bi piranî jî bi pratîka wergêriya wî ra pêwendîdar e. Lewre wek temsîlkarê nivîskarî di zimanê armanç da Kulekê wergêr, di kurdî da hevkarê nivîskariya J. M. Coetzee, W. Faulkner, G. G. Márquez, Jorge Luis Borges, J. Joyce, Juan Rulfo, Orhan Pamuk, Mario Vargas Llosa, R. L. Stevenson e. Bi gotineke din hevînivîskarê berhemên van nivîskaran e, yanî berhemînerê kurd ê van berhemên biyanî ye. Berhemên nivîskarên behskirî di kurdî da ji nû ve nivîsandine û cîhana wan a fîksiyonel bi hemû teknîkên wan ên vegêranê ji nû ve saz kiriye. Ne mimkin e ku bi rêya vê pratîkê, tecrube û karîgeriya wan nivîskaran derbasî Kulek nebûbe. Di vegêranên Kulek da ceribandina teknîkên vegêranên modernîst/postmodernîst, hewildana berfirehkirina sînoren kurdî û xasma zordayîna li hevoksaziyê jî heta asteke bilind dikare bi tecrubeya wergêriyê û tesîra berhemên wergêrayî bê şîrovekirin. Herweha di mînaka Kawa Nemir da jî em karîgeriya wergêranên ku kirine, yekser li ser poetîka û zimanê wî yê helbestê dibînin ku bixwe jî di hevpeyvînên xwe da bal kişandiye ser. Nemir, di hevpeyvînên xwe da diyar kiriye ku poetîkaya helbesta xwe li ser helbesta Rojava daniye û ji helbestvanên wekî Yannîs Rîtsos, T. S. Eliot, hin şairên Anglosakson ên wek W. B. Yeats, W. Whitman, E. Pound, W. Shakespeare, W. Blake teknîkên helbestê wergirtiye. Divê bê zanîn Nemir, helbestên van helbestvanên behskirî û jê tesîrbûyî wergêrane kurdî. Diyar e di pêvajoya wergêranê da ziman û şêweya wan tecrube kiriye, wê tecrubeyê paşê di poetîkaya wî da xwe wek karîgeriyê daye der. Bo nimûne, Nemir soniyên Shakespeare wergêrane kurdî û bi xwe jî di şêweya soniyên van helbestvanan da helbest nivîsandine. Ev mînaka herî eşkere ye ku berbiçav dike, mijûliya wî ya bi wergêranê li ser helbestvaniya Nemir karîger bûye. Tesîra wergêranên wî yê helbestan li ser zimanê helbestên wî berbiçav e ku carcaran bi gotinên wek *zimanekî çêkirî*, *nefambar*, *girîft* û helbestvan bi xwe jî bi gotinên wek *ferhengîst*, *ferhengperwer*, *ferhengperest* hatiye rexnekirin (Nemir, 2016a; Nemir, 2016b). Helbestvanî bersiva van rexneyan bi gotinên “feqîrî ye ku meriv tenê bi peyva zarokatiya xwe edebiyatekê çêbike” (Nemir, 2016b) dane. Diyar e pratîka wergêriyê kiriye ku Nemir bêtir têkeve nav ferhengan, serdestî bêjeyên kevn û nû bibe, bîra xwe ya bêjeyan xurt û dewlemend bike. Mijûliya bi bêjeyan ra, lêgerîna bêje û vegotina herî guncan di pêvajoya wergêranê da di heman demê da bûye pêkereke amadekar bo çêbûna zimanê wî yê helbestê. Nêrîna Nemir a li kiriyara wergêranê, nîşaneyên tesîra wergêranê li ser wî tîne ber çavan ku li gor wî wergêran, *lêvegerîna dewlemendiya zimên e*, *keşîfkirina îmkanên zimanê armanç e*, *rêyek e bo bidestxistina îmkanên herî berz ên vegotinê* (Çakır, 2010), *zindihîştina zimanê kurdî* (Kayî, 2023), *nîşandayîna xurtbûn û hêza kurdî ye* (Gültekin, 2023). Herweha li gor fikra wî wergêraneke kûr û dûr edebiyata wî zimanî jî kûr û berfireh dike (Gültekin, 2023). Herçiqas, wergêranê edebiyata kurdî bi giştî kûr û dûr nekiribe jî di şexsiyeta wergêranê nivîskar/helbestvan da bandoreke wê ya xurt heye li ser

dewlendbûna zimanê kurdî û ceribandînen edebî yên ezmûnî, bikaranîna şêwe û teknîkên ciyawaz di edebiyata kurdî da.

Pêwîst e çend gotin derbarê wergêrana ji soranî bo kurmancî jî bîn kirin. Herçend zaravayêke kurdî be jî bo xwînerên kurmancî pêwîstî bi wergêran/kurmancîzekirina metnên soranî heye.⁹ Di çarçoveya mijara gotarê da dikare bê gotin hevterîbiya geşedana wergêranê û geşedana edebiyata kurdiya Bakur (kurmancî) di şexsiyeta wan wergêrên kurd da ne mewzûbehs e ku ji soranî ber bi kurmancî –herçiqas navzimanî be- wergêranê dîkin. Yanî wergêrên ku ji soranî bo kurmancî gelek berhemên sereke wergêrane, tevkarîyeke berçav di warê berhemanîna telîf da nekirine. Lewra angaştê giştî ya vê gotarê ku îdîa dike wergêrên kurd ên metnên edebî wergêrayî di heman demê da nivîskarên giring in û di geşedana edebiyata kurdî da beşdariyê berçav kirine, nikare ji bo wergêrên behskirî bê gotin ku berhemên soranî kurmancîze dîkin. Lêbelê kurmancîzekirina berhemên soranî ji aliyekî din ve pir giring e ji bo edebiyata kurdiya Bakur (kurmancî). Kurmancîzekirina berhemên soranî, di nav edebiyatên du zaravayên sereke yên kurdî da nêzîkbûnekê pêk tîne ku ev yeka jî dê edebiyata kurdî ber bi hevgirtinekê ve bibe. Bi saya wergêranên navzimanî haya kurdên perçeyên cuda ji hev û rewşa edebiyatên hev dibe û hevkarîgeriyek pêk tê di navbera nivîskarên soranî û kurmancî da. Nivîskarên wekî Eta Nehayî, Bextiyar Elî, Şêzad Hesên, Ferhat Pîrbal û hwd. bêguman bi wergêranên nav-zimanî hatine naskirin ji aliyê kurdên Bakur ve. Li aliyê din eger berhemên edebî yên kurdiya Bakur (kurmancî) neyên soranîzekirin li Başûr dê çend kes Hesênê Metê, Mehmed Uzun, Şener Özmen, Ciwanmerd Kulek, Kawa Nemir û nivîskarên din ên kurdiya Bakur (kurmancî) nas bikin? Diyar e ji bo yekgirtîniya edebiyata kurdî wergêrana kurdî ya navber-zaravayî/nav-zimanî pêwîst e.

Encam

Li gor teoriya polisîstemê edebiyat sîstemêke pir-tebeqeyî ye. Bi gotineke din edebiyat ji sîstemên cuda pêk hatiye, yanî polisîstemek e. Wergêrana edebî yek ji wan sîsteman e ku polisîstema edebiyatê pêk tînin. Wergêrana edebî, li gor rewşa edebiyatê yan di çeperê da yan jî di navenda polisîstema edebiyatê da bi cih dibe. Di rewş û qonaxên ku edebiyatek “ciwan”, “bêhêz” yan di nava “qeyranan” da be wergêran dibe pêwîstiyek. Hingê wergêran di navenda polisîstema edebiyatê da bi cih dibe û di însa û şewegirtina edebiyatê da roleke giring û çalak dibîne. Di vê çarçoveyê da edebiyata kurdî ya modern mînakeke guncan e ji bo nirxandîneke ji perspektîfa polisîstemê. Lewre di astên cuda da her sê taybetmendî jî hene di warê edebiyata kurdî ya modern da ku wergêranê pêwîst dîkin. Edebiyata kurdî ya modern nisbeten dereng dest pê kiriye, yanî “ciwan” e. Li aliyê din di edebiyata kurdî ya modern da ji destpêkekê wêdetir çend destpêk hene. Yanî di nava qonaxên edebiyata kurdî da zîncireyêke berbiçav nîne, her qonaxa wê heta astekê destpêkeke jinûve ye. Ji ber vê edebiyata kurdî ya modern ji destpêka ewil heta niha di nava “qeyran”ê da ye û her qonaxa wê “xala werçerxê” ye. Herweha ji xeynî mînakên awarte dijwar e mirov îdîa bike ku edebiyata kurdî ya modern bi giştî edebiyateke pir bihêz e. Ji ber hebûna van her sê taybetmendîyan wergêrana edebî cihekî giring heye di warê edebiyata kurdî ya modern da.

Herçiqas bizavên mezin di wergêrana kurdî da pêk nehatiye û edebiyata kurdî ya modern bi rêya wergêranê bi tevayî û bi lez bişêwe û modernîze nebûye, wergêran karîgerî û rola xwe hebûye di geşedana edebiyata kurdî da. Di hemû qonaxên edebiyata kurdiya Bakur (kurmancî) ên di sînorên vê xebatê da -Sovyet, Hawar, Swêd, Bakur- wergêrana kurdî û edebiyata kurdî ya modern, wek du qadên hevterîb û hevkarîger pevne bi pêş ketine. Karîgerî û rola wergêranê di edebiyata kurdî ya modern da, bêtir di şexsiyeta wan nivîskaran da tê dîtin ku wergêrî jî kirine. Tê dîtin ku hin nivîskarên kurd, berî nivîskariya profesyonel berhem ji edebiyatên cihanê wergêrane û hinek ji karên nivîskarî û wergêriyê bi hev ra kirine/dîkin. Kirin û mijûliya wergêranê ku venivîsandînek e, bo wergêrên kurd bûye faktoreke amadekar bo destpêkirina nivîsandîna berhemên telîf û bihêzkirina nivîskariya xwe. Pêvajoya wergêranê kiriye ku wergêrên kurd potansiyel û dewlemendiya vegotina kurdî bibînin, bîra zimanî ya kurdî vekolin û herweha cure, şêwe û teknîkên cuda di kurdî da biciribînin. Di vê peywendê da –wekî ku bi xwe jî

⁹ Xuya ye di navbera her du zaravayên kurdiya Bakur (kurmancî û zazakî) da jî pêwîstiyêke wiha heye. Heta li gor Kırkan di nava hemû wergêranên di zazakî da herî zêde metnên kurmancî hatine wergêran (bnr. 2022: 39). Lêbelê em nikarin heman tiştî ji bo wergêrana metnên zazakî bo kurmancî bibêjin.

diyar dikin- karîgeriya wergêranan hem ji aliyê şeweyî (teknîkên vegêranê) û hem ji aliyê zimanî ve li ser wergêr-nivîskarên kurd bûye. Wergêran bûye hincet ku wergêrê kurd zimanekî edebî çêbike û rê û rêbazên afirandina cîhana fiksiyonel tecrube û pratîze bike ku faktoreke amadekar e bo nivîskariyê û amrazek e bo kemilîna nivîskariyê. Di hemû qonaxên edebiyata kurdî da, temsîlkar û nivîskarên giring ên wan qonaxan şixulkariya wergêrana edebî kirine û bêgûman nivîskariya wan ji pêvajoya wergêranê sûdewar bûye. Di vê çarçoveyê da berçav e ku wergêran di geşedana edebiyata kurdî da rol û karîgeriyeke erênî hebûye.

Wek nirxandina giştî em dikarin bibêjin wergêrana kurdî, di çarçoveya vekolana bîra zimanî, keşîfkirina potansiyel û dewlemendiya vegotinê, di astên ciyawaz da ceribandina bikaranîna zimên, berfîrehtirina derfetên zimanî, bi kurtî avakirin û amadekirina zimanekî estetîk da tevkarî li çêkirin û pêşvebirina edebiyata kurdî ya modern kiriye. Ji aliyê din ve wergêrana kurdî, bi rêya amadekirina wergêrî/ê bo nivîskariyê beşdarî di geşedana edebiyata kurdî ya modern da kiriye. Ji wergêriyê ber bi berhemdayîna nivîskaran ve wergêranê erkeke wek kaxeza karbonê girtiye ser xwe. Bi gotineke din herçiqas wergêr-nivîskarên kurd, cureyên nû, awayên cuda yên vegêranê, teknîkên fiksiyonê ji berhemên wergêrayî û telif ên zimanên serdest nas kiribin jî bi rêya wergêrana kurdî ew di kurdî da tecrube û pratîze kirine. Ev tecrube û pratîk ji bo hinekan bûye pêşgava nivîskariyê û ji bo hinekan bûye rêyeke xurtkirina nivîskariya xwe.

Çavkanî

- Aydoğan, M. (2001). *Berê Gotin Hebû*. Stenbol: Doz.
- Aytaç, G. (2009). *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*. İstanbul: Say.
- Azereng, E. (1378 (1991)). *Şemme-yî ez Ketab, Ketabxane ve Neşr-i Ketab*. Tehran: Neşr-i Ketabdar.
- Azereng, E. (1400 (2021)). *Tarîx-i Tercume der Îran*. Tehran: İntişarat-i Qoqnûs.
- Bay Gülveren, Ö (2019). Yazın Çevirisi ve 19. Yüzyıl Roman Çevirilerinin Türk Yazınına Etkisi. *Doğubattı*. j. 88, (42-63). Ankara.
- Bayram, M. (2019). Li Hollandayê ‘Şevên Zivistanê’ dê dest pê bike, yek ji beşdaran Kawa Nemir e. (Dîroka Ragihaniyê: 20.04.2023). <https://m.bianet.org/kurdi/print/204464-li-hollandaye-seven-zivistane-de-dest-pe-bike-yek-ji-besdaran-kawa-nemir-e>.
- Bedir-Xan, C. A. (1998). Qurd û Qurdistan Bi Çavê Biyaniyan 1. Fırat Cewerî (amd), *Hawar 1 hejmar 1-23 (1932-1933)*. (383-384). Stocholm: Nûdem.
- Cewerî, F. (amd.) (1996). *Nûdem Werger*, 1/1.
- Elî Seydoyê Gewrî (1998). Sehitî Le bo zmanê qurdî. Fırat Cewerî (amd), *Hawar 1 hejmar 1-23 (1932-1933)*. (447). Stocholm: Nûdem.
- Ergün, Z. (2023). *Edebîyata Kurdî ya Sovyetê*. İstanbul: Nûbihar.
- Even-Zohar, I. (1990). The Position of Translated Literature Within The Literary Polysystem. *Polysystem Studies. Poetics Today International Journal for Theory and Analysis of Literature and Communication*. (11/1) (1990), (45-51).
- Even-Zohar, I. (2004). Yazınsal Çoğuldizge İçinde Çeviri Yazının Durumu. di nav Mehmet Rifat (amd.), *Çeviri Seçkisi 2 Çeviriyi Düşünenler Çeviri(bilim) Nedir?* da (191-201). Saliha Paker (wer.). İstanbul: Dünya Kitapları.
- Gültekin, C. (2023). Kawa Nemir: Ruhıyla, kalbiyle ve toprağıyla, bizim yurdumuz anadilimizdir. (Dîroka Ragihaniyê: 20.04.2023). <https://gazetekarinca.com/kawa-nemir-ruhuy-la-kalbiyle-ve-topragiyla-bizim-yurdumuz-anadilimizdir/>.

- Hezil, S. (2021). Werger û Wêjeya Kurdî. *Kürt Araştırmaları Dergisi Dosya: Kürt Edebiyatı*. j. 5, (156-170).
- Kan, G. (2023). Tecrübeya Wergêrana Kurdî di Peywenda Îdeolojî û Patronajê da. *Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*. j. 15, (472-489).
- Karadağ, A. B. (2019). Türk Edebiyat ve Kültür Dizgesinin Konukseverliğinde Çeviri Roman Deneyimi. *Doğubatu*. j. 88, (9-25). Ankara.
- Karadeniz, Y. (2012). İran'da Tercüme Faaliyetleri ve Tercüme Edilen Kitaplar (1830-1904). *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*. (5/21), (178-191).
- Kaya, S. (2022). *Lêkolînek li ser Radyoşanoyên di Radyoya Rewanê da* (Teza Masterê ya Çapnebûyî). Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî, Bingöl.
- Kayi, B. (2023). Hevpeyvîn bi Kawa Nemir re – 1, Kawa Nemir: “James Joyce bi Ulyssesê hişmendiya kolonîzebûyî têk bir”. (Dîroka Ragihaniyê: 05.05.2023). <https://bianet.org/kurdi/pirtuk/276732-kawa-nemir-james-joyce-bi-ulyssese-hismendiya-kolonizebuyi-tek-bir>.
- Kırkan, A. Zazacaya Çevrilen Eserler ve Bunların Çeviri Bilimsel İncelemesi. *The Journal of Mesopotamian Studies*. j. 7 (1), (25-42).
- Lefevere, A. (1992). *Translation, Rewriting, and the Manipulation of Literary Fame*. New York: Roudledge.
- Nebez, C. (2021). *Wergerandin Huner e*. (ç. 5). Wan: Sîtav.
- Nemir, K. (2010). Kawa Nemir: Shakespeare Kürtçe Bir Devrimdir. *Mimesis*. (Dîroka Ragihaniyê: 07.05.2023). <https://www.mimesis-dergi.org/2010/02/kawa-nemir-shakespeare-kurtce-bir-devrimdir/#prettyPhoto>.
- Nemir, K. (2016a). Kawa Nemir (I): Tiştê serekî ku li Diyarbekir ez aciz kirim, pîrbûna civatên edebî yên bêedeb bû. (Dîroka Ragihaniyê: 06.05.2023). <https://inanolo.blogspot.com/2016/04/kawa-nemir-i-tiste-sereki-ku-li.html>.
- Nemir, K. (2016b). Kawa Nemir (II): Feqîrî ye ku meriv tene bi peyva zarokatiya xwe edebiyatekê çêbike. (Dîroka Ragihaniyê: 06.05.2023). <https://inanolo.blogspot.com/2016/05/kawa-nemir-ii-feqiri-ye-ku-meriv-tene.html>.
- Öpengin E. (2011). Bizava Wergerê di Kurmanciyê de. *In Proceedings of 1st International Conference on Kurdish Literature*, xxx. Sanandaj: University of Kurdistan Press.
- Özyön, A. (2019). Çeviri Etkinliğinin Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi İçindeki Yeri ve Önemi. *Doğubatu*. j. 88, (27-40). Ankara.
- Reşid T. (2012). Sovyetler Birliği'nde Kürt Edebiyatı. di nav Vecdi Erbay (brh.) *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyatı da* (202-212). İstanbul: Ayrıntı.
- Sakallı, C. (2014). *Karşılaştırmalı Yazınbilim ve Yazınlararasılık / Sanatlararasılık Üzerine*, (ç.3.). Ankara: Seçkin.
- Saraç, M. A. Y. (2022). Gazel. (Dîroka Ragihaniyê: 05.03.2024). <https://ansiklopedi.tubitak.gov.tr/ansiklopedi/gazel>.
- Tahir Gürçağlar, Ş. (2021). *Çevirinin ABC'si*. (ç.5.). İstanbul: Say.
- Töre, S. (2015). *Translation and Ideology: A Study of Paratexts of Turkish Translations of the Kurdish Mesnevi Mem û Zin in the Republican Period*. (Teza Masterê ya Çapnebûyî). Zanîngeha Boğaziçiyê. Stenbol.
- Uzun, M. (2005). *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*. İstanbul: İthaki.

Xusrewbeygî, H. & Feyzî, M. X. (1391). Tercume der dewre-yi Qaçar (ez 1210 h. Ta payan-i Pewreyi Muzefferî). *Edeb-i Farsî, dewre-yi 2*, Şimare 2, Şimarey Peyapey 10. (125-146).

Yıldırımçakar, Z. (2021). *Wenger Wek Kirineke Çandî Li Ser Rêyên ji Wergernasiyê ber bi Kurdolojiyê ve*. Wan: Peywend.

Yılmaz, F. (2021). *Dasa Şemo û Çakûça Gorkî Xwendineke Berawirdkî li dor Şivanê Kurmanca û Sêbareya Gorkî*. Wan: Peywend.

Zeraq, D. (2022). *Rengê Hebûnê*. Diyarbakır: Lîs.

Extended Abstract

This study examines the impact and role of translation in the emergence, formation and development of modern Kurdish literature. The translation studies of the Soviet, Hawar, Swedish and Northern schools of Kurdish literature, whose works were written in the Kurmanji dialect of Northern Kurdish, provided the framework for the study. The theoretical framework of the study is based on Itamar Even-Zohar's polysystems theory. According to polysystems theory, which states that culture consists of many systems and that these systems are in constant contact with each other, literature is one of these systems. Literature is a multi-layered system, a polysystem, which itself consists of many literary systems. Literary translation, e.g. of children's literature, crime novels, science fiction, etc., is a system that forms the literary polysystem. In cases where literature is a) young and not yet formed, b) weak or peripheral, c) literary gaps, crises and turning points in literature, literary translation, when it is in the "central" position within the literary polysystem, has the power and influence to actively shape the literary polysystem. In this case, translation acts as a modernizer/reformer. New genres, forms of expression, literary movements, themes, motifs, etc. find their way into the target literature through translation.

In the history of Turkish translation, the translation movement of the Tanzimat period and the translation movement launched in 1940 under the leadership of Hasan Ali Yücel are the best examples of the role of the reformer and developer and the effect of translation on literature. In this respect, Turkish translation movements and the impact and role of translation in shaping Turkish literature are the most appropriate examples to be evaluated within the framework of polysystem theory. In the history of Kurdish translation, there have never been such major translation events. Like Kurdish literature, Kurdish translation has a fragmented and discontinuous appearance for a number of reasons. Moreover, both professions have been practised by a small number of self-sacrificing people and have not attracted the attention of the majority from the beginning until today. However, since the 1930s, Kurdish translation and literary activities have developed in parallel. In this context, it has been noted that translators who have brought works from world literature into Kurdish are also important authors who have contributed to modern Kurdish literature with their copyrighted works. However, the three situations Even-Zohar points out, which emphasise the innovative and formative role of translation for literature, also apply to Kurdish literature. Therefore, translation has naturally played a regenerative and formative role for Kurdish literature as well.

It is unrealistic to claim that new literary genres, styles, techniques, forms of expression, etc. have found their way into Kurdish literature through translation, because the Kurds are multilingual. Kurds have followed the innovations and developments in literature through translations and national works in the official languages of the states they live in. However, it is clear that translation is a field of practice and a preparatory factor for the Kurdish writer to produce literary works and create a literary language. In this respect, the act of translation for the Kurdish writer is a field prior to the production of a copyrighted work. It can be said that the Kurdish translator has written his own works with the experience he has gained in writing a foreign literary work in his own language and with the linguistic and literary tools he has obtained through the translation process.

In Soviet Kurdish literature, which is one of the birth stages of modern Kurdish literature in Northern Kurmanji, E. Şemo, H. Cindî, E. Evdal and other Kurdish writers went through an intensive translation experience before writing their own literary works. These authors have translated dozens of works from Russian and Armenian literature into Kurdish. For example, the author of the first Kurdish novel, E. Şemo, adapted the first literary work published in Soviet Kurdish literature, the play *Koçeke Derewîn*, from the work of an Armenian writer. Considering that the adaptation is a kind of translation, it is clear that there is a direct influence in this case. H. Cindî, who translated 15 plays from Armenian, also wrote several plays with Kurdish copyright. In this context, it can be said that the translation experience is an instructive and guiding tool for the Kurdish translator to start writing and plays a preparatory role for the emergence of modern Kurdish literature. Apart from this, it is also possible to recognise the impact of translation on Kurdish literature of the time through some syntax features adapted to Kurdish and words borrowed from Russian and Armenian.

In the Hawar school, one of the most important schools of Kurdish literature, translation occupies an important place. C. A. Bedir-Xan, the founder of *Hawar*, and E. S. Gewrî, one of the authors of the journal, emphasised the importance and necessity of translation. In *Hawar*, C. A. Bedir-Xan, K. Bedir-Xan, N. Zaza, Qedrican and O. Sebrî either translated foreign texts directly or adapted them into Kurdish. While the Bedir-Xan brothers' knowledge of a large number of foreign languages and their translation experience have a noticeable effect, N. Zaza's is very clear. The stories that Zaza adapted to Kurdish are among the most successful examples of contemporary stories in Kurdish.

In the Swedish school of Kurdish literature, the influence and role of literary translation on the development of literature was made clear. The leading representatives of the school wanted to start a translation movement and

as a first step the first Kurdish translation magazine, *Nudem Werger*, was published. In addition, the leading writers of the school translated some fundamental works of world literature into Kurdish. We can say that the Kurdish writers in Sweden consider translation as a kind of pre-authorship and have gained experience in this field themselves before submitting copyrighted works. Writers such as H. Metê and F. Cewerî can be cited as examples of this situation.

The parallel development of Kurdish translation and literature, which returned to its homeland after 2000, and the interaction between translators and authors continued. In this context, K. Nemir, D. Zeraq, L. Laleş, C. Kulek, who are famous and important writers of Kurdish literature, are also in an effective and productive position in the field of Kurdish translation. In this period, it is noteworthy that Kurdish translators tend to modernist/postmodernist and the most difficult to translate works instead of translating the basic classics of world literature. In the works of some writers such as C. Kulek and K. Nemir from this period, the traces of the linguistic and stylistic influences of the translation experience can be seen.

As a result, translation was of great importance for Kurdish translators to discover the richness and potential of the Kurdish language, to penetrate deep into the Kurdish linguistic memory and to experience the narrative power of Kurdish on different levels. The translation experience was a preparatory process for Kurdish translators and writers to create a literary language. It can be said that translation has contributed to the development of Kurdish literature by preparing the language, which is the most basic tool for the creation of literary works. On the other hand, translation has had a positive impact on Kurdish literature by preparing the Kurdish translator to become a writer.